

Zimanê Kurdî di Dîasporayê de, Berpirsyariya Dê û Bavan û Erka Civakê



Raportajeke rojnamevanî bi Xatûna Asya Xerzan re (helbestvan û werger) – Pêşangeha Navneteweyî ya Pirtûkan li Frankfurtê, 10.10.2026.. A.Raporê Ayoob Ahmed Qader

Pirsa, Zarokên we li vir, li Almanyayê, ji dayik bûne. Ma we wan fêrî zimanê Kurdî kiriye? Bi giştî, zarokên Kurdên Kurmanc li Almanyayê çawa dikarin zimanê Kurdî fêr bibin?

Gelek spas ji bo vê hevpeyvînê. Îro, li Pêşangeha Navneteweyî ya Pirtûkan a Frankfurtê, ez gelek kêfxweş im ku bi heval, hevkar, rewşenbîr û nivîskarên hêja re li hev

civiyane û derfet me heye ku li ser mijarekê girîng biaxivin. Ew jî zimanê Kurdî û fêrkirina zimanê me ji zarokên xwe re di malê de ye.

Min sê zarok hene û çar neviyên min jî hene. Dema ku temenê min de sal bû, ez hatim Almanyayê û zêdetirî çil sal in ku ez li vî welatî mezin bûme û xwendime. Di malbata me de her tim bi Kurdî diaxivîn û zimanê Kurdî zimanê sereke yê malbata me bû. Dê û bavê min her tim bi Kurdî diaxivîn.

Mixabin, ji ber siyaset û pergalên dagirkerî û zordestiya li ser zimanê me, li beşên cuda yên Kurdistanê zimanê Kurdî bi awayên cuda hatiye paşguhkirin. Li Başûr û Rojavayê Kurdistanê zimanê Erebî, li Rojhilatê Kurdistanê zimanê Farsî û li Bakurê Kurdistanê zimanê Tirkî di gelek aliyên jiyana rojane de serdest bûne. Di encamê de, mixabin, hin Kurd di malê de jî bi zimanekî din ji bilî Kurdî diaxivîn.

Lê di dîasporayê de, bi taybetî li Almanyayê, derfetek baş heye ku em zimanê xwe biparêzin û wî bigihînin zarokên xwe. Divê em tiştekî baş bidin zarokên xwe, da ku ew ziman û nasnameya xwe ji bîr nekin.

Pêşniyara min ji dê û bavan re ev e ku ji dema zarokatiyê ve ji zarokên xwe re bi Kurdî çîrokan bixwînin. Zarok mîna şitilekî nû ye; tiştê ku di destpêka jiyana wî de tê çandin, paşê bandorê li mezinbûna wî dike.

Dema ku zarokên me hîn biçûk in û hişê wan ji bo fêrbûnê amade ye, xwendina çîrokên Kurdî ji wan re gelek girîng e. Îro em gelek pirtûk û berhemên edebî hene, bi taybetî çîrok û pirtûkên zarokan. Divê em vê derfetê baş bi kar bînin.

Herwiha, em nikarin xwe bi tevahî ji bandora pergala perwerdehiyê ya Almanyayê dûr bigirin. Zarokên me sibehê diçin dibistanê û heta nîvro an piştî nîvro di hawîrdoreke Almanî de dimînin û mezin dibin. Ji ber vê yekê, dema ku vedigerin malê, divê em bi wan re bi Kurdî biaxivin.

Ez her tim vê ramanê di hişê xwe de digerînim: Dema ku zarokên me vedigerin malê û derî li pişt xwe digirin, divê ew mal bibe Kurdistanêke biçûk. Di wê Kurdistanê biçûk de divê bi Kurdî bê axaftin, çîrokên Kurdî bên xwendin û zarokên me bi ziman û çanda xwe ve girêdayî bimînin.

Ez dixwazim li ser neviyên xwe jî rastgo bim. Mixabin, carinan dibînim ku ew jî, mîna gelek zarokên Kurd ên Bakur, dibêjin: «Ez fêr dikim, lê nikarim bi Kurdî biaxivim.»

Heke zarokên min Kurdî baş nizanibin, lê Almanî baş bizanin, dema ku bi Kurdî diaxivin, gelek caran peyvên Almanî tevî gotinên xwe dikin. Ev yek jî bi vî yekê ve girêdayî ye ku dayika neviyên min Alman e. Ev jî bo min mijareke gelek hestiyar û girîng e, ji ber ku ziman beşeke girîng a nasnameya mirovan e.

Ez hewl didim ku neviyên min ji zimanê xwe dûr nekevin. Şevan ji wan re çîrokên Kurdî dixwînim, her çend dayika wan Alman be jî. Li gorî baweriya min, ev cure hewldan dikarin di parastina zimanê me de roleke girîng bilîzin.

Pirsa: Ma li Almanyayê navend an dibistanek heye ku zarokên Kurdên Kurmanc lê zimanê Kurdî fêr bibin?

Mixabin, li bajarê ku ez lê dijî navendeke wisa tune ye. Lê ez dizanim ku Yekîtiya Mamosteyên Kurd di çend salên borî de hewl daye ku derfetên fêrbûna zimanê Kurdî ji bo zarokan peyda bike.

Heke li bajarekî hejmareke baş ji malbatên Kurd hebin, ew dikarin daxwaz bikin ku ji zarokên wan re dersên zimanê Kurdî bên dayîn. Ew dikarin serdana **Schulamt** (Ofîsa Perwerdehiyê) bikin û daxwaz bikin ku dersên Kurdî ji bo zarokên wan bên organîzekirin.

Heke daxwaznameya wan were pejirandin, Yekîtiya Mamosteyên Kurd dikare mamosteyek ji bo wî bajarî destnîşan bike û zarok jî dikarin beşdarî dersan bibin.

Yanî derfet heye, lê pêwîst e ku malbat bixwazin û li pey van derfetan bigerin.

Almanya welatekî demokratîk e û divê em ji mafên xwe sûd werbigirin. Ziman mafekî bingeîn e mirovan e; divê tu kes ji mafê axaftinê bi zimanê dê û bavê xwe bêpar neyê hiştin.

Carinan, dema ku em qala zimanê xwe dikin, hin kes wisa diaxivin ku xwestina mafê zimanê me tiştekî neasayî be. Lê pirs pir hêsan e: Heke ev ziman zimanê dê û bavê te ye, çima divê tu nikaribî bi wî zimanî biaxivî?

Tu kes nikare bê sedemeke qanûnî û rewşa mafê zimanê te ji te bistîne. Ji ber vî yekê, divê em bi hişyarî û bi awayekî rêxistinî daxwaza mafên xwe bikin.

Mînakî, heta ku ez bi bîr tînim, cara yekem li bajarê Bremenê dersên zimanê Kurdî ji bo zarokan hatin organîzekirin. Çend mamoste di wê projeyê de beşdar bûn, di nav wan de Mamoste Zerdeşt Haco û Roni Sterk, herwiha çend mamosteyên din ku niha navên wan ji bîra min çûne.

Ev mînak nîşan dide ku heke malbat bixwazin û hevkarîya hev bikin, dikarin derfetek baş ji bo fêrbûna zimanê Kurdî ji zarokên xwe re biafirînin.

Pirsa : Li gorî baweriya te, zarokên Kurd, çi Kurmanc bin an Soranî, divê li dîasporayê çî bikin da ku zimanê xwe biparêzin?

Ew dikarin gelek tiştan bikin. Li Almanyayê navendên ciwanan, cihên betlaneyê û kampên ciwanan hene ku dibistan wan organîze dikin, wek **Jugendherberge** (mêvanxaneyên ciwanan).

Ev cih in ku ciwan dikarin demê li wir derbas bikin, hev nas bikin û ezmûnên nû bi dest bixin.

Pêşniyara min ew e ku rêxistinên Kurd jî ji bo zarok û ciwanên Kurd bername û kampên taybet organîze bikin. Di van kampan de zarok û ciwanên Kurd ji bajarên cuda bîr cem hev, hev nas bikin û têkiliyên di navbera xwe de xurt bikin.

Herwiha, ew dikarin bi rêya înternetê û torên civakî ciwanên Kurd nêzî hev bikin. Lê pêwîst e kesên ku rêberiya van ciwanan bikin, piştgiriya bidin wan û alîkariya wan bikin ku bi awayekî erênî beşdarî civakê bibin, hebin.

Mixabin, ez dibînim ku hin ciwanên Kurd di bin pirê de, li nêzî rawestgehên trêne û li cihên giştî dicivin. Hin jî wan dikevin nav pirsgerêkên vexwarina alkolê û bikaranîna madeyên hişbir, di nav de eroîn. Ev mijareke xemgîner e, ji ber ku ciwanên me sermayeya paşeroja civaka me ne.

Divê rêxistin, malbat û kesên xwedî ezmûn destên xwe bidin hev û ji bo ciwanan hawîrdoreke saxlem û aram biafirînin; hawîrdoreke ku ew bikaribin tê de şiyarên xwe pêş bixin, xwendin û fêrbûnê bidomînin û bi ziman û çanda xwe serbilind bin.

Li gorî baweriya min, pêwîst e kesên ku bibin rêberên ciwanan û rêyek baş nîşanî wan bidin hebin. Heke em îro girîngiyê bidin zarok û ciwanên xwe, sibê em dikarin xwedî civakeke bihêztir û hişyartir bibin.

Parastina zimanê Kurdî tenê berpirsiyariya dê û bavan nîne; ew berpirsiyariya tevahiya civaka Kurdî ye. Heke em dixwazin zimanê me bijî û nifşên paşerojê jî bikar bînin, divê em li malê, li dibistanê, li navendên civakî û di jiyana rojane de girîngiyê bidin wî.

Zimanê Kurdî tenê amûrek ji bo axaftinê nîne; ew beşek ji nasname, dîrok û çanda me ye. Parastina zimanê me, parastina rabirdû û paşeroja xwe ye.

زمانی کوردی له دیاسپۆرا: بهرپرسیاریتی دایک و باوکان و نه‌رکی کۆمه‌لگا

راپۆرتاژێکی رۆژنامه‌وانی له‌گه‌ڵ خاتوو ئاسیا خه‌رزان (شاعیر و وەرگیر) پێشانیگای نێوده‌وله‌تی کتێب له‌ فرانکفۆرت 10.10.2026 ئاماده‌کردنی: ایوب احمد قادر

پرسیار: منداڵه‌کانتان لێره له‌ ئه‌لمانیا له‌دایک بوونه، ئایا فیری زمانی کوردی‌تان کردوون؟ به‌ گشتی، منداڵانی کوردی کرمانج له‌ ئه‌لمانیا چۆن ده‌توانن زمانی کوردی فیر ببن؟

زۆر سوپاس بۆ ئهم گفتوگۆیه، ئهمرۆ له‌ پێشانیگای نێوده‌وله‌تی کتێبی فرانکفۆرتین، زۆر خوشحالم که له‌گه‌ڵ هاوڕێ و هاوکار و رۆشنبیر و نووسه‌رانی به‌ریز کۆبووینه‌ته‌وه و ده‌رفه‌تی ئه‌وه‌مان هه‌یه‌ له‌باره‌ی بابه‌تیکی گه‌رنه‌وه‌ گفتوگۆ بکه‌ین، ئه‌وه‌یش زمانی کوردی و فیرکردنی زمانه‌که به‌ منداڵانه‌مان له‌ ماله‌وه‌یه. من سێ منداڵم هه‌یه و چوار نه‌هه‌شم هه‌ن. کاتیک ته‌مه‌نم ده‌ ساڵ بوو، هاته‌م ئه‌لمانی و زیاتر له‌ چل ساڵه‌ لهم و لاتهدا گه‌وره‌ بوومه و خویندووومه. له‌ ماله‌وه‌ماندا هه‌میشه به‌ کوردی قسه‌مان کردووه و زمانی کوردی زمانی سه‌ره‌کی خێزانه‌که‌مان بووه. دایک و باوکم هه‌میشه به‌ کوردی قسه‌یان ده‌کرد. به‌داخه‌وه، به‌هۆی سیاسه‌ت و سیسته‌می داگیرکهری و سه‌رکوتی زمانه‌که‌مان، له‌ به‌شه‌ جیاوازه‌کانی کوردستاندا زمانی کوردی به‌ شیوه‌ی جیاواز په‌راویز خراوه له‌ باشوور و رۆژئاوا زمانی عه‌ره‌بی زاله، له‌ رۆژه‌لات زمانی فارسی و له‌ باکوور زمانی تورکی به‌سه‌ر زۆریک له‌ ژبانی رۆژانه‌دا زال بوون. له‌ ئه‌نجامدا، به‌داخه‌وه هه‌ندیک له‌ کوردان له‌ ماله‌وه‌ش به‌ زمانیکی جگه له‌ کوردی قسه‌ ده‌که‌ن.

به‌لام له دیاسپۆرا به تاییه‌تی له ئەلمانیایا، دهرفته‌تیکێ باشمان ههیه بۆ ئهوهی زمانه‌که‌مان بپاریزین و به منداله‌کانمان بیگه‌یه‌نین. پێویسته شتیکێ باش به منداله‌کانمان ببه‌خشین تا زمان و ناسنامه‌ی خۆیان له‌بهر نه‌که‌ن.

پێشنیارم بۆ دایک و باوکان ئه‌وه‌یه که له مندالییه‌وه بۆ منداله‌کانیان به کوردی چیرۆک بخویننه‌وه. مندال و هه‌ک شه‌تلیکی تازه‌ی وای، ئه‌وه‌ی له سه‌ره‌تای ژيانێ چێ تێیدا بچیندریت، دواتر کاریگه‌ریی له‌سه‌ر گه‌شه‌کردنی ده‌بیت.

کاتیک منداله‌کانمان هه‌شتا بچووک و مێشکیان بۆ فیربوون ئاماده‌یه، خویندنه‌وه‌ی چیرۆکی کوردی بۆیان زۆر گرنگه. ئه‌مڕۆ کتیب و به‌رهممی ئه‌ده‌بیی زۆرمان هه‌یه، به تاییه‌تی چیرۆک و کتیبی مندالان ده‌بیت ئه‌م دهرفته به‌کاربه‌نین.

هه‌روه‌ها، ناتوانین خۆمان به ته‌واوی له کاریگه‌ریی سیسته‌می خویندنی ئەلمانیایا دور بخه‌ینه‌وه. منداله‌کانمان به‌یانی ده‌چنه قوتابخانه و تا نیوهرۆ یان دوا‌ی نیوهرۆ له ژینگه‌یه‌کی ئەلمانیادا ده‌بن و گه‌وره ده‌بن. بۆیه کاتیک ده‌گه‌ڕێنه‌وه ماله‌وه، پێویسته له‌گه‌ڵیان به کوردی قسه به‌که‌ین.

من هه‌میشه ئه‌م بیرۆکه‌یه‌م هه‌یه که کاتیک منداله‌کانمان ده‌گه‌ڕێنه‌وه ماله‌وه و ده‌رگا‌که‌یان له‌دوا‌ی خۆیان داخست، ئه‌و ماله‌ ده‌بیت بپێته کوردستانیکێ بچووک. له‌و کوردستانه‌ بچووکدا ده‌بیت به زمانی کوردی قسه به‌کریت، چیرۆکی کوردی بخویندریته‌وه و منداله‌کانمان به زمان و کولتووری خۆیان په‌یوه‌ست به‌مێننه‌وه.

من له‌باره‌ی نه‌وه‌کانمیشه‌وه ده‌مه‌وێت راستگۆ به‌م. به‌داخه‌وه، هه‌ندیک جار ده‌بینم که هه‌ک زۆریک له مندالانی کوردی باکوور، ده‌لێن: (من تێده‌گه‌م، به‌لام ناتوانم به کوردی قسه به‌که‌م). ئه‌گه‌ر منداله‌کانم کوردیه‌کی باش نه‌زانن، به‌لام ئەلمانییه‌کی باش بزانه‌ن، کاتیک به کوردی قسه ده‌که‌ن، زۆر جار وشه‌ی ئەلمانی تێکه‌ڵ به قسه‌کانیان ده‌که‌ن که به‌کوردی قسه ده‌که‌ن، ئه‌وه‌ش که نه‌وه‌کانم دایکیان ئەلمانه. ئه‌مه بابه‌تیکێ زۆر هه‌ستیار و گرنگه بۆ من، چونکه زمان به‌شتیکێ گرنگی ناسنامه‌ی مرۆفه. من هه‌وڵ ده‌ده‌م بۆ ئه‌وه‌ی نه‌وه‌کانم له زمانه‌که‌یان دور نه‌که‌ونه‌وه. له‌شه‌ودا بۆیان چیرۆکی کوردی ده‌خوینمه‌وه، هه‌رچه‌نده دایکیان ئەلمانییه. به‌بروای من، ئه‌م جو‌ره هه‌ولانه ده‌توانن پرۆلیکی گرنگ له پاراستنی زمانه‌که‌ماندا به‌گیرن.

پرسیاری دووهم: ئایا له ئەلمانیایا ناوه‌ند یان قوتابخانه‌یه‌ک هه‌یه بۆ فیرکردنی زمانی کوردی به مندالانی کوردی کرمانج؟

به‌داخه‌وه له شاره‌که‌ی مندا ناوه‌ندیکی وا نییه، به‌لام ده‌زانم که یه‌کێتیی مامۆستایانی کورد له چه‌ند سالی رابردوودا له ئەلمانیایا هه‌وڵی داوه دهرفته‌ی فیربوونی زمانی کوردی بۆ مندالان دا‌بین به‌کات. ئه‌گه‌ر له شاری‌که‌دا ژماره‌یه‌کی باش له خێزانه کورده‌کان هه‌بن، ده‌توانن داوا به‌که‌ن که منداله‌کانیان وانه‌ی به‌که‌ن و داوا به‌که‌ن که وانه‌ی کوردی (Schulamt) زمانی کوردی بخوین. ده‌توانن سه‌ردانی شوولنامت (بۆ منداله‌کانیان دا‌بین به‌کریت.

ئه‌گه‌ر داواکارییه‌که قبول به‌کریت، یه‌کێتیی مامۆستایانی کورد ده‌توانیت مامۆستایه‌ک بۆ ئه‌و شاره‌ دیاری به‌کات و منداله‌کانیش له وانه‌کاندا به‌شدار بن.

واته دهر فەت هەمە و پێویستە خێزانەکان داواکار بن و بەدوای ئەم دەر فەتاندەدا بگەڕێن.

ئەلمانیای و لاتیکە دیموکراتیکە و پێویستە لە مافەکانی خۆمان کەلک وەر بگرین. زمان مافیکی بنەرەتیی مەرۆقە؛ هیچ کەسێک نابێت لە مافی قسەکردن بە زمانی دایک و باوکی خۆی بێبەش بکەیت.

جاریک کاتیک باس لە زمان دەکەین، هەندیک کەس بە شیوەیەک قسە دەکەن وەک ئەوەی داواکردنی مافی زمانەکەمان شتێکی نائاسایی بێت. بەلام پرسیارەکه زۆر سادەیه: ئەگەر زمان زمانی دایک و باوکی خۆتە، بۆچی نابێت بتوانیت بەو زمانە قسە بکەیت؟

کەس ناتوانێت بە بێ ھۆکاریکی یاسایی و شەڕعی مافی زمانەکەت لێ بسەنیتەو. بۆیە پێویستە بە ئاگایی و بە شیوەیەکی ڕێکخراو داوای مافەکانمان بکەین.

بۆ نموونە، تا ئێوە جێیە لە بیرمە، یەکەمین جار لە شاری برێمندا وانە لە زمانی کوردی بۆ منداڵان ڕێک خرا. چەند مامۆستایەک لەو پرۆژەیدا بەشدار بوون، لەوانە مامۆستا زەر دەشت حاجۆ و ڕۆنی ستێرک، ھەروەھا چەند مامۆستایەکی دیكە کە ئێستا ناوەکانیان لە بیرم نەماوە.

ئەم نموونەیه پیشان دەدات کە ئەگەر خێزانەکان داواکار بن و ھاوکاری یەکتەر بکەن، دەتوانن دەر فەتیکە باش بۆ فێربوونی زمانی کوردی بۆ منداڵەکانیان دروست بکەن.

پرسیار: بە بروای تو، بۆ ئەوەی منداڵانی کورد، جا کرمانج بن یان سۆرانی، لە دیاسپۆرا زمانی خۆیان بپارێزن، چی دەبێت بکەن؟

دەتوانن چەندین کار بکەن. لە ئەلمانیای ناوەندەکانی گەنجان و شوێنی پشوو دان و کەمپی گەنجان ھەن کە قوتابخانەکان ڕێکی دەخەن، وەک ھۆستیلی گەنجان یوگینت ھێر بێرگە

ئەمانە شوێنێک کە گەنجان دەتوانن تێیدا کات بەسەر ببەن، یەکتەر بناسن و ئەزموونی نوێ بە دەست بھێنن. پێشنیارم ئەوەیە کە ڕێکخراوە کوردییەکانیش پرۆگرام و کەمپی تاییبەت بە منداڵ و گەنجانێ کورد ڕێک بخەن. لەو کەمپانەدا منداڵ و گەنجانێ کورد لە شارە جیاوازەکانەو کۆ ببەنەو، یەکتەر بناسن و پەیوەندی نیوانیان بە ھێز بکەن.

ھەروەھا، دەتوانن لە ڕێگەی ئینتەرنێت و تۆرە کۆمەڵایەتیەکانەو گەنجانێ کورد نزیک بکەنەو. بەلام پێویستە کەسانێک ھەبن کە ڕێبەری ئەم گەنجانە بکەن، پشتگیرییان بکەن و یارمەتییان بدن بۆ ئەوەی بە شیوەیەکی ئەرینی لە کۆمەڵگادا بەشدار بن.

بەداخەو، من دەبینم هەندیک لە گەنجانێ کورد لە ژێر پرد و لە نزیک ویستگەکانی شەمەندەفەر و لە شوێنە گشتییەکان کۆ دەبنەو و هەندیکیان تووشی کێشە لە خواردنەو کحول، ماددە ھۆشبەرەکان و ھێروئین دەبن. ئەمە بابەتێکی نێگەرەنکەرە، چونکە گەنجانێ ئێمە سەرمايە لە داھاتووی کۆمەڵگاکەمان. پێویستە ڕێکخراوەکان، خێزانەکان و کەسانی خاوەن ئەزموون دەست بە دەست یەکتەر بدن و بۆ گەنجان ژینگەیکە تەندروست و ئارام دروست بکەن، ژینگەیکە کە تێیدا بتوانن تواناکیان پەرە پێ بدن، خوێندن و فێربوون بەردەوام بکەن و بە زمان و کولتووری خۆیان شانازی بکەن.

بە بروای من، پێویستە کەسانێک ھەبن کە ببە ڕێبەری گەنجان و ڕێگایەکی باشیان پیشان بدن. ئەگەر ئێمە ئەمڕۆ گەرنگی بە منداڵ و گەنجانمان بەدەین، سبە لە دەتوانین کۆمەڵگایەکی بە ھێزتر و ئاگاترمان ھەبێت.

پاراستنی زمانی کوردی تهنه ئهرکی دایک و باوکان نییه ئهرکی ههموو کۆمه‌لگای کوردییه. ئه‌گهر ده‌مانه‌وێت زمانه‌که‌مان بژی و نه‌وه‌کانی داها‌تووش به‌کاری به‌ئین، ده‌بی‌ت له‌ ماله‌وه، له‌ قوتابخانه، له‌ ناوه‌نده کۆمه‌لایه‌تییه‌کان و له‌ ژیا‌نی رۆژانه‌دا گرنگی پێ بده‌ین.

زمانی کوردی تهنه‌ ئامرازیک بۆ قسه‌کردن نیه به‌شی‌که له‌ ناسنامه، می‌ژوو و کولتووری ئێمه. پاراستنی زمانه‌که‌مان پاراستنی رابردوو و داها‌تووی خۆمانه.